

Sûriye, şoreş û pêşeroj

Dr. Kamiran Haj Abdo*

Piştî dora 48 salan ji sîstema tekpartîfî û tekrewiyê, piştî 48 salan ji bînpêkirina mafên mirovan û azadiyên bîngêhîn li seranserî Sûriyê û piştî ewqas sal ji siyaseta şoven û projeyên nijadperest di dermafê gelê Kurd li Sûriyê de, xelkê Sûriyê serûber serê xwe li hember rêjîma Esed ya tekrew, dîktator û şoven hilda. Destpêk roja 15.03.2011-ê bû. Dawî jî mixabin hîne ne diyar e. Di pêvajoya van 17 heyvan de bêtirî 27000 kes hatine kuştin û bêtirî 200000 kes girtî û wenda ne, dora 167000 kesî jî li welatên derdorê derbeder bûne. Xelkê Sûriyê serûber jî bûye dilê êş û cefayeke mezin û toşî rewşeke zor zehmet dibe.

Waha xuya ye jî ku ev rewşa dijwar dê hîn berdewam bike.

Belkî hinek nexwazin bawer bikin, lê bi baweriya



min rastî ev e, tevî ku tehl e jî. Çima? Ji ber ku rewşa Sûriyê, ev çend heyv in berve şerekî navxweyî çûye. Gem û lîwana wî şerî jî ne bi dest xelkê Sûriyê de ye. Gelek aliyên herêmî û navnetewî di wî şerî de hevpişk in. Mirov dikare bêje ku çawa xelkê Sûriye di wî şerî de bûye du beş (hêza rikber li aliyekî, rêjîm li aliyê dî) weha jî herêma Rojhilata Navîn û Cîhan jî di wî şerî de bûne du beş. Turkiyê, Si'ûdiyê û Qeter,

herweha jî Amerîka û Ewropa piştgiriya rikberiya Sûriyê dikin (lê her hinek ji wan rengekî rikberiyê ku li gor kêfa wan e). Li hemberê Îran, Rûsiya û Çîn li pişt rêjîma Esed in. Ji vê xerabtir hin welatên cîran weke Îraq û Lubnanê jî di wî şerî de bûne du "perçe": Hukûmeta Federal ya Îraqê û Hizbollaha Lubnanê piştgiriya rêjîma Esed dikin; Herêma Kurdistanê ya Federel û beşeke Lubnanê jî piştgiriya daxwazên gelê Sûriyê dikin, bona azadî û wekhevîyê. Şerê li Sûriyê welatên cîran, herêma Rojhilata Navîn û Cîhan kirine du perçe û ew li ser xaka Sûriyê bi destê sûriyan bi hev ketine. Kêm yan zêda herdu aliyên şer yê Sûriyê (rêjîm û rikberî) di destên wan de bûne kukle (bûkok, pêlîstik, marionette). Her yekê ji wan dewletan armançek heye, derdê wan ne ji dûr ne ji nêzîk ne avakirina sûriyeke demokrat e. Her yek ji wan li gor berjewendiya xwe helwestekê digre. Si'ûdiyê û Qeter dixazin rol û bandora Îranê li herêmê kêm bikin û li Sûriyê erebên sunnî bêne ser desthilatê. Tirkiye jî ji bo xewnên xwe yê osmanî heman tiştî dixwaze. Bi ser de jî bazareke gewre ji aboriya xwe re amade dike. Meleyên Îranê û Hizbullah jî naxwazin hevbendekî xwe (yê ku di navbera wan herduyan de xelek û grêdaneke girîng e) ji dest bidin. Derdê Rûsiya jî ew e ku dewsa piyên xwe li ber perava Derya Spî bipolarêze, ji ber ku eger ew wir jî ji dest bide, nema ciyê wê di derya spî de dimîne.

Ji ber sedemên jêrîn dewletên **D.R (10)**

Azadî ji girtiyên siyasî û xebatkarên gelê me yê Kurd re , yên di girtîgehên Sûriyê de